


SÎNEMAYA SERBIXWE

E-Fanzîna Sînema, Çand û Hunerê

Hejmar 1
Berfanbar
2018



Ji bo Civakê
Ji bo Hunerê
Ji bo Jiyanê
Sînema...

Edîtor û Berpirs
Rûmet Med Kaya

Redaksiyon
Rûmet Med Kaya

Bergsazî û Rûpelsazî
Ahmet Tîrêj Kaya

Navnîşan
www.sinemayaserbixwe.
blogspot
sinemayaserbixwe@gmail.
com
sinenuce@gmail.com

Instagram / Facebook
@sinemayaserbixwe

Twitter
@sinemaserbixwe

*Nivîskaran ji nivîsên xwe
berpirs in.*

Naverok

Ji Edîtor - 3

“Sînemaya Kurdî: Bêwelatî, Sînor
û Mirin” / Rûmet Med - 4, 5

“Efsaneyên Selkiyan û Fîlmê
Ondîne” / Mela Mihyedin - 6, 7

Qîrîna Bêdengiyê û Hêviyê:
“Gavê Leglegê Ku Biderengî” /
Rûmet Med - 8, 9

“Şeva Xîzê”: Belgefîlmek li ser
Nesaxên Silikozisê! / 10

Belgefîlmê “Bîra Mi’ Têtin” - 11

Belgefîlmê “Xanî Reş e” - 11

Rêç û êşên ên jiyanê: “Demsala
Kergedan” / Ciwan Stêrk - 12

Pirtûkên Sînema û Çand-Hunerê
- 14, 15

Replîk - 16



Ji Edîtor

Silav û rêz xwînerên hêja!

Ji “Brayên Lumierê” û “Alice Guy-Blaché”, bi wir de Sînema ango “Hunera Heftemîn” ji gelek qonaxan derbas bû, geşedan û pêşveçûna xwe didomîne.

Sînema ji bo kesên ku derd û gotinên wan hene amûr û derfeteke gelek mezin e. Di nav dîroka sînemayê de gelek derhêner û sînemavanên bîraver derketin, hest û ramanên xwe anîn zimanê. Di geşedan û girseyîbûna sînemayê de; gelek rêbazên ên hunerî, rastibîniya civakî, heyamî û serbixwe û ên din pêk hatin.

Hunera “Sînema”, di nav rojên jandar û tarî de bû hêviyeke germ û ronak û bihara vê bêdemsal şîn bû û vedibe... “Hunera Heftemîn”; ruh û hêza ên dîmenan, newayan, peyvan û wênayan e û me wekî pirtûkan, di nav asoyên hestan û ramanan de digerîne.

Em bi saya sînemayê cihê ku me qet neçûne ji wan dibinîn, çand û jiyanên hemû mirovahiyê dinasînin. Rû û çavên sînemayê, sînorên ku li ser cîhanê radike û ew dikare bi demê re hemû xeletiyên û pêşdaraziyên tune bike.

Yekem hejmar a E-Fanzîna bi Kurdî “Sînemaya Serbixwe”, bi nivîs û gotarên xwe yê li ser Sînema, Çand-Hunerê, weke dengê nû û ciwan li pêşberî xwendevanên xwe.

Bimînin bi xêr û xweşiyê de
Bi hev re ji Hejmarên nû ve

“SÎNEMAYA KURDÎ: BÊWELATÎ, SÎNOR Û MIRIN”

Rûmet Med

Di van salên dawiyê de, pêwendiya mirovan ji pirtûkên hunerî û çandî ve zêde dibe û bi taybetî jî pirtûkên li ser sînemayê hatine nivîsandin gelekî eleqeyan dibînin.

Li gorî salên dawiyê, pirtûkên sînemayê ji aliyê weşanxaneyên huner û çandê ve bêtir têne çap kirin û wergerandin, hejmarên pirtûkên bîrdoz û senoryoyê her ku diçe zêdetir dibe û ev rewş jî dilên sînemahez û hunerhezan kêfxweş dike.

Çapa duyem a pirtûka “Sînemaya Kurdî: Bêwelatî, Sînor û Mirin”, di dawiya meha Gelawêj a 2017ê de ji hêla Agora Kitalîgî re derketî û du mehan paşê jî çapberiya pirtûkê derçû.

Ev xebata girîng û watedar ji aliyê Derhêner û Sînemavanê Kurd Mizgîn Mujde Arslan re hate amade kirin, cara yekem di sala 2009ê de hatî bû çap kirin û di demeke kurt de gelek eleqeyan dît.

Ji “Brayên Lumierê” û “Alice Guy-Blaché”, bi wir de Sînema ango “Hunera Heftemîn” ji gelek qonaxan derbas bû, geşedan û pêşveçûna xwe didomîne.

Destpêka Sînemaya Kurdî, wek filmê “Zerê” (1926) yê Derhênerê Ermen Hamo Beknazaryanê tê qebûl kirin û di sala 1926ê li Ermenistana Sovyetê hate kişandin. Li dû vê dîrokê, bi taybetî li Ewropayê û li gelek welatan de film û belgefilmên Kurdî hatin kişandin.

Di pênc parçeyên Kurdan de, ji ber qedexeyan û ne pêşketina pişesaziya sînemayê (di wateya Endustrî de), Derhêner û Sînemavanên Kurd di dîrokeke piçek ne dûr de xebatên xwe dest pê kirin.



Di ev salên dawî de hejmara filmên Kurdî zêdetir dibe, filmên Kurdî di mîhrîcanên filman de tînan nîşan didin û xelatan wergirin.

Derhênerên wekî Yilmaz Guney, Behmen Qobadî, Hiner Saleem, Samira Mahmelbaf, Shawkat Amin Korkî, Kazim Oz, Mizgîn Mujde Arslan, Husayin Karabey, Orhan Eskikoy û gelek derhênerên û sînemavanên navdar derkevin.

Di sînemaya Kurdî de û li ser sînemavanên Kurdan de bandorên Derhênerê

navdarê Kurd Yilmaz Guneyê gelek mezin û girîng e, Guney bi hest û ramanên xwe ve di sînemayê de hertim dê riyeke ronî bibe.

Pirtûka “Sînemaya Kurdî: Bêwelatî, Sînor û Mirin”, geşedana dîrokî ya Sînemaya Kurdî dilêkolîne.

Gotar û nivîsên li ser sînemaya Kurdî hatine nivîsandin; ji bo temaşavan, sînemavan û xwendevanan berhev kiriye û pirtûk ji bo sînemahezan çavkaniyeke mezin û girîng e.

“Sînemaya Kurdî: Bêwelatî, Sînor û Mirin” (Kürt Sineması: Yurtsuzluk, Sınır ve Ölüm)

Nivîskar/Amadekar: Mizgîn Mujde Arslan

Weşanxane: Agora Kitaplığı

400 Rûpel

Pirtûkên din ên Mizgîn Mujde Arslan:

“Rejîsor’ Atîf Yılmaz” / Weşanxane: Agora Kitaplığı, 220 Rûpel (2007)

“Yeşim Ustaoglu: Av, Mirin û Rêwîti” (Yeşim Ustaoglu: Su, Ölüm ve Yolculuk) Weşanxane: Agora Kitaplığı, 164 Rûpel (2010)



Belgefîlm û Kurtefîlmên Der-

hêner Mizgîn Mujde Arslan:

Belgefîlman: “Kirasê Mirinê: Hewîtî” (2009). “Dana Bayramı” (2010). “Ez Firiya Tu Mayî Li Cî” (2012).

Kurtefîlman: “Lîstika Dawî” (2006). “Tov” (2009). “Şare” (2010) - Derhêner: Mizgîn Mujde Arslan, İrfan Taşkin. “Asya” (2012). “Melek” (2015). “Arîn” (2017).

EFSANEYA SELKIYAN Û FÎLMÊ ONDÎNE

Mela Mihyedîn

Selkî di mîtolojiya Îskoç, Îrlandî û Îskandînavyan de lehengek ji kesayetên behrê ye. Selkî tê maneya Jinên Fok lê ev kesayetên behrê tenê ne jin in, di nava wan de mêr jî hene. Ev kesayetên efsûnî di nava behrê de jiyan xwe berdewam dikin. Wekî mirovên ser rûyê erdê ew jî di binê behrê jiyanê beşerî dijîn, lê li gorî insanên ser rûyê erdê dengê van mirovên avî xweştir û zelaltir e.

Gava dest bi stranên xwe dikin havîrdor bê deng dimîne û ew awazên wan yên efsûnî herkesî heyranê xwe dike.

Wekî hemû gelê pêşketî gelê Îskoç, Îrlandî û Îskandînavyan jî li çanda

xwe û li efsaneyên xwe xwedî derketine. Ji bo ku herdem di bîra mirovan de be û neyê jibîrkirin ji aliyê şaredarî û hikûmeta wan ve hem peykerê Selkiyan û pûlê wan hatine çêkirin. Li gorî efsaneyê Selkiyan jinên wan pîrr bedew in û yê ku çav bi wê bikeve tu carî nikare wê ji bîr bike. Gava

selkiyek ji hundirê behrê derdikeve der, kurkê xwe ji xwe dike û dikeve şiklê jinên ser rûyê erdê. Wisa ser rûyê erdê adapte dibin ku meriv tu carî nikare bikeve ferqa rastiye. Heta di hemû çîrokên selkiyan de herî dawî leheng dighin rastiye lê wê demê jî veqetandin dikeve navbera wan de.



Heger mêrekî li ser rûyê erdê dil bide jineke Selkî, çiroka wan bi piranî bi xemgînî diqede. Kesê/a ku bêhtir di bin bandora têkiliyê de dimîne mirovên erdî ne. Ji bo ku mirovên behrî (Selkî) ji yên erdî azadtir in û xwe bi cihekî vî heta dawiya emrê xwe naxapînin. Lê dîsa jî heger mirovên erdî kurkê yên behrî bibînin û wî kurkî veşêrin an jî bişewitînin wê demê Selkî heta dawiya emrê xwe êsîrî ser rûyê erdê dibe û tu

carî nikare terka havalê/a xwe bike. Lê dîsa jî mirovên behrî ne wekî yên erdî ne û ne xemxur in. Lewma bi rehetî dikarin terka mirovan bikin. Çîrokên Selkiyan piranî li ser jinan hatinen gotin. Herçiqasî jinên Selkiyan wek lehengan li pêş bin jî çîrokên li ser Selkiyên mêr jî hene.



*Peykerê Selkiyekê (Başurê Îng.)


Heger jinek erdî bixwaze bi Selkiyekî mêr re bikeve têkilî divê heft heb hêstirên çavên xwe li behrê wer bikî. Piştî hestirên xwe tevî behrê kir wê demê Selkiyê mêr ji behrê derdikeve û dostaniya wan dest pê dike. Ehlê Rojavayî li çanda xwe, li folklorê xwe, li wêjeya xwe û li dîroka xwe xwedî derdikeve. Van nîşaneyên xwe yên netewî bi rêzefilm, film, pirtûk û belgefilman nemir dikin.

Bi van xebatan gelê din yên cîhanê di bin bandora xwe de dihêlin. Lê li gel vê jêhatiya mirovên Rojavayî, mirovên Rojhilatî tu xebatî nakin ji bilî tiraltiyê. Lewma dem bi dem ji çanda xwe dûr dikevin û nêzî çanda Rojavayîyan dibin. Rojhilatî tèn asteke wisa ku ji çanda xwe nefret dikin.

Ondine (Ondîne), filmekî bi vê terza hatiye kişandin. Fîlm hem çand û hem jî efsaneya gelê Îskoç û Îrlandiyan derdixe pêş. Fîlm, li ser masîgirekî Îrlandî yê bi navê Syracuse (Colin Farrell) hatiye seknandin.

Rojekê dema ku bi keştiya xwe diçe ku masiya bigire, jineke xweşik (Alicja Bachleda) dikeve tora wî. Ev jin jiyana Syracuseyî bi temamî diguherî. Bi navê Annie (Alison Barry) keça Syracuseyî heye û li gorî keça wî; jina ketî tora bavê wê Selkî ye.

Fîlm di hundirê xwe de çîrokek germ ji bo şevên zivistanê dihebîne. Herçiqasî çîrok gellek caran li ber çavan bejî çavên mirov kor in û herdem tiştê dixwazin tînin ber çavan.



*Selkiya Jin Li Ser Pûlekî

QÎRÎNA BÊDENGIYÊ Û HÊVIYÊ: “GAVÊ LEGLEGÊ KU BIDERENGÎ”



Rûmet Med

Çîrokbêjekî nûjen e Derhênerê navdarê Yewnanîstanê Theodoros Angelopoulos, qala ên çîrokên û stranên qedîmê ve dike û bi kamera xwe re di sînora û asoyên cîhanê de digere.

Wekî filmên; “Nerîna Ulîsê” (1995), “Bêdawî û Rojekî” (1998), “Mêrga Digirî” (2004), û “Xubara Demê” (2008), filmên yê Theodoros Angelopoulos, “Gavê Leglegê Ku Biderengî” (1991) jî gelek bandoran bi min kirin.

Derhênerê navdar, di dilê jiyane û xwezayê de qala çîrokên qedîm û rojaneyê ve dike û rewş û sîtavên ên Rojhilatanavîn, Herêma Balkanan, Egeryê û hemû erdnîgariya cîhanê nîşan dide.

Çîroka filmê “Gavê Leglegê Ku Biderengî”, di nav sînorekê de destpê dike û qala jiyane Penaberan, Rojnamevanekî û Siyasetmedarekî ve dike.. Di rêwitiyê de, bi nêrîna Rojnamevanekî ciwan re; ji aliyekî rûyê hêviyê û windakirinê û ji aliyekî jî dilê êşan û hezê xuya dibin..

Dengên atmosfera newayan, xwezaya jiyane û rengê qîrîn û hêviya hemû mirovahiyê mezin dibin...

Di Stasyoneke Trêne de, zêmar û girînen Dayîkên Kurdan tîn bihîstin û li dû dengêkî nêzîk dibêje “Em ê Bi Serkevin”, ev qîrîna ku tîne bihîstin dengê hemû Mirovahiyê ye... Jiyane Penaberî, rengê sînore, windakirin û lêgeran, newayên stran û kilaman, dengê bêdengiyê, robarê û kolanan bi hev re diçe...

Sehneya veqetaneke jandar û derketina
dîrekên elektrîk qor bi qor xuya dibin...

Di herikîna ruhê demê de, li dû dawiya
çîrokan; rêwîti û dest pê kirinên nû hene..
Jiyan bixwe rêwîtiyeke dirêj û westiyayî ye,
di dawiyê de rojek rengê şînbûna biharê
vedibe..

Di nav filmên Theodoros Angelopulosê
de; kirûya sînor, penaberî, azadî, bêdengî
û evîn ciyekî gelek girîng digirin. Ji ber
ku sînor; êş e, hesret e û birîn e, di avên
behrekê de mirovên tenê mayînê ne û rûyê
penaberiye ye... Hez; hestekî çavkanî û
jiyan e, a ku dilê mirovan mezin dike hez
e û evîn e, ramanên rastîn û nemir bi hezê
re şînbûna biharê xwe tînin... Bêdengî qala
gelek tiştan ve dike, di navbera ruhê jiyanê
de bêdengî bi xwe deng û rengên ên nû
berhev dike, mirov di bêdengiyê de dikare

dengên jiyanê û xwezayê dibihîse, ango
bêdengî hilmên dengên xuya dike û dilê
hêviyê ye...

Filmên Theodoros Angelopulosê di
hemû cihanê de dengvedan û bûn klasîk.
Derhênerê mezin di nav sînemayê de
zimanekî helbestkî û taybetmend afirand
û bi peyv, dîmen û newayên xwe bû ne-
mir. Ev filmên bîraver, bûn germa hêviya
hemû Bîndest û Rencberên Mirovahiyê
û Xwezayê, di rê de hertim dê roniyê
bêdawî bibin...

“To Meteoro Vima Tou Pelargou” (Gavê
Leglegê Ku Bi Derengî / Leyleğın Geciken
Adımı / The Suspended Step of the Stork)
- 1991 - Derhêner: Theodoros Angelopulos
û Senaryo: Theodoros Angelopulos,
Tonino Guerra, Petros Markaris



“ŞEVA XÎZÊ”: BELGEFÎLMEK LI SER NESAXÊN SILIKOZISÊ!

Derhênerê Belgefilmên ên “Metre” û “Dîroka Mirina Avê” Ali Ergul, Belgefilmek bi navê “Şeva Xîzê” (Kumun Gecesi / The Night of the Sand), li ser jiyayên Karkerên Xîzkirina Kotê û qala ku ji sedemên û encamên ên nexweşiya Silikozisê ve dike, kişand.

Di belgefilmê de, Karkerên Xîzkirina Kotê qala ku çawa ketine vê nexweşiya kujende re û ji sedemên vê nesaxiyê ve dikan.

Belgefilmê “Şeva Xîzê” li Gundê Taşlıçayê (Çirik) yê girêdayî Navçeya Kanîreşa Çewlîgê (Bingöl) hate kişandin.

Karkerên Xîzkirina Kotê; bi giştî li bajarên mezinan de dixebitîn in, bi piranî Kurd in. Nesaxiya Silikozisê, di gelek beşên karê de tene dîtî û nesaxiyeke giran û kujende ye. Li gorî daneyên ên Sendika, Fermî û Saziyan, her salî ji ber Nesaxiya Silikozisê gelek karkeran jiyayên xwe ji dest didin û di rewşên xirabê de dijîn.

Fragmana Belgefilmê:

https://twitter.com/aliergul_/status/1060802802769891328?s=19

Ji bo agahî:

<http://kotiscileri.org/silikozis-nasil-bir-hastalik/>



BELGEFİLMÊ “BÎRA MI’ TÊTIN”

Belgefilmê “Bîra Mi’ Têtin” yê Derhêner Selîm Yıldızê, qala komkujîya Roboskiyê re dike, jiyana rojane û bazirganiya sînoran nîşan dide.

“Bîra Mi’ Têtin”, di çarçoveya bernameya ên gelek Mîhrîcanên Filman de hate nîşan dan û xelatan wergirtî.

Belgefilmê “Bîra Mi’ Têtin”
(Hatırlıyorum) - 2016 - / Derhêner:
Selîm Yıldız



BELGEFİLMÊ “XANÎ REŞ E”

Pirtûkên helbestên yê Ferroxzadê ji gelek zimanan ve hatiye wergerandin.

Helbestvan di heman demê de bi sînema, wênesazî, şano re jî eleqedar bûye.

Werger û Nivîskar Mûhsin Ozdemîr, helbestên Furûx Ferroxzadê bi navên pirtûkên, “Em Baweriyê Bi Destpêka Demsala Sar Bînin” (2013) û Hemû Berhem” (2014), bo Kurdî wergerandî û pirtûkan ji hêla Weşanên Ronahî re hatin weşandin.

Lînka Belgefilmê: “Xanî Reş e”
<https://youtu.be/XJGABtligKk>



Belgefilmê bi navê “Xanî Reş e” ji aliyê Helbestvanê navdarê Îranê Furûx Ferroxzad re, di sala 1962’an de hate kişandin.

“Xanî Reş e”, qala jiyânên ên nesaxên kotiyên ve dike û agahiyên li ser vê nexweşiyê dide. Helbestvan Furûx Ferroxzad, di jiyânê xwe de gelek êşên kişandî ye, lê hêvîya dilê xwe hertim mezin kiriye.

RÊÇ Û ÊŞÊN ÊN JIYANÊ: “DEMSALA KERGEDEN”



Nivîs: Stêrk Ciwan
Weger: Rûmet Med

Behmen Qubadî yek ji Derhênerên herî baş ên Sînema Kurdî ye. Di sala 1969ê de li Banê, bajarekî girêdayî Rojhilatê hate dinê.

Di salên xwendinê xwe de di radyoyeke de xebitî û li dû bi komekî sinemayê re kurt-filman kişandin. Perwerdehiya xwe ya Zanîngehê niv hêla.

Behmen Qubadî wekî Cafer Panahî û gelek Derhêner û Hunermendan ji ber hin sedeman Îranê terk kir.

Di nav filmên Behmen Qubadî de, axaftinan (diyalog) kêm in, zimanê dîmênê xurt e û alegoriyan gelek in.

Derhêner Qubadî, di sînemaya xwe de bi giştî qala jiyana çîrokên rastînên ên Kurdistan ve dike û hilma rengê sînoran nişan dide.

Derhêner, filmên xwe bi awayî nû-rastîbînê û weke belgefilman kişandiye. Bikaranîna ên kameraya milan, dengên xwezayî, kişandinên cihên derveyî, lîstokvanên amator, şeweya derhênerê nişan didin.

Di filmên Derhêner Behmen Qubadî de gelek aliyên hevpar hene; xweza, sînor û rêwîtiyê cîyekî girîng digirin.

Di navên filmên wî de bi giştî, navên heywanan û xwezayê; ‘Hesp’, ‘Kûsî’, ‘Pisîng’ û ‘Hîv’, “Demsal”, ‘Mij’ hene, di heman demê de, di navê filmê “Demsala Kergedan” jî naveke heywanê ‘Kergedan’ heye.

Derhêner, bi navên filman ve jî ji hest û ramanên xwe tîne zimanê. Dibe ku jî navê filmê “Demsala Kergedan” ji navê lîstika “Kergedan” ya nivîskarê navdarê Frensayê Eugène Lonesco re tê..

Belkî jî navê cureyeke heywanan ê ku ji holê rabûyê ye.. An jî qala qurfbariyekê ku li binî çermeke stûrê de ye, re dike..

Filmê “Demsala Kergedan” (2012) ya Behmen Qubadî, îlhama xwe ji jiyane helbestvanekî navdarê Kurd Sadegh Kamangarê re wergirtî ye, atmosfera û bûyerên vê çaxê nîşan dide.

Film li Stenbolê hatibû kişandin, tê de gelek lîstikvanên navdar leyîstine. Di filmê de, Sahel Farzan (Behruz Vusukî) û Hevsara wî Mîna (Monica Bellucci) tîne heps kirin, Mîna piştî deh salan ji Girtîgehê derdikevê û ji wê re dibêjin ku mêrê te miriye.

Mîna li dû vê bûyerê bi hev re du zarokên xwe diçin Stenbolê. Piştî 20 salan Sahel jî ji hepsê derdikevê û malbata xwe digere.

Di atmosfera filmê de, rêç û êşên jiyane xuya ne û her ku diçe xwe derbirin dike, filmê “Demsala Kergedan” di Xelatên Filman a Asya Pasîfikê de di gelek waran de xelatan wergirtî.

NÛÇE: Derhênerê navdarê Kurd Behmen Qubadî, kişandinên filmên xwe ya nû bi navê “Let The Dogs Go Home”, di nav sala 2019ê de dê dest pê bike.

Film, qala çîroka Boksorekî Îranê ku di nefî de, li Amerîkayê jiyane xwe didomîne re dike. Kişandinên filmê dê li Stenbolê û New Yorkê bibe.

Filmên Behmen Qubadî;
<https://m.imdb.com/name/nm0315842/>



PIRTÛKÊN SÎNEMA Û ÇAND-HUNERÊ



“DÎROKA ŞANOYA KURDÎ”

Pirtûka “Dîroka Şanoya Kurdî”, jêdereke li ser geşedana dîrokî ya Şanoya Kurdî ye û ji hêla Nivîskar/Şanoger Çetoyê Zêdo û Yavuz Akkuzu ve hate amadekirin.

Nivîskar/Amadekar: Çetoyê Zêdo û Yavuz Akkuzu


Weşanxane: Weşanên Peywend, 288 rûpel - 2015

“BI HEMÛ FILMÊN XWE YILMAZ GUNAY”

Pirtûka “Bi Hemû Filmên Xwe Yilmaz Gunay”, hemû mijar û kurtî yên çîrokên filmên yê Derhêner û sînemavanê navdarê cîhanê Yilmaz Gunayê berhev kiriye û bi wêneyên filmên derhênerê ve hatiye weşandin.

Pirtûk ji aliyê Agah Ozgüç re hate amadekirin û lêkolîneke girîng û watedar e.

“Bi Hemû Filmên Xwe Yilmaz Gunay” (Bütün Filmleri İle Yilmaz Güney) - Nivîskar/Amadekar: Agah Özgüç - Weşanxane: Agora Kitaplığı. Rûpel: 379 – 2015



“SÎNEMAYA KURDÎ”

Ev xebata li ser sînemaya Kurdî ji çar lêkolînan pêk tê.

- 1- Nerîneke Giştî Li Ser Sînemaya Kurdî
- 2- Sînemaya Bêwelat; Sînemaya Kurdî
- 3- Di Peydabûna Sînemaya Netewî De Pirsgirêkên Sînemaya Kurdî
- 4- Zarê

“Sînemaya Kurdî”

Nivîskar: Dilazad A.R.T

Weşanxane: Weşanên Zanîngeh. Rûpel: 55 - 2017

Awayê Çapê: Dijital e-pirtûk pdf



“DERHÊNERÊN SÎNEMAYA JINÊN CÎHANÊ”

Pirtûka “Derhênerên Sînemaya Jinên Cîhanê”, qala sînema û xebatên ên Yekem Derhênerê Jin Alice Guy-Blaché û Jane Campion, Lucrecia Martel, Park Nam-ok, Haifaa Al-Mansour, Safi Faye, Yeşim Ustaoglu ve dike.

“Derhênerên Sînemaya Jinên Cîhanê” (Dünya Kadın Sinema Yönetmenleri)

Nivîskar/Amadekar: Gabrielle Kelly û Cheryl Robson
Werger: Nazli Pakkan. Weşanxane: Agora Kitaplığı,
Rûpe: 400l - 2016



“SÎNEMAYA CÎHANÊ”

Pirtûk ji çar lêkolînên li ser sînemaye pêk hatiye.
Di ve pirtûkê de lêkolînên ku hene ev in:

- 1- Bi Giştî Sînema û Dîroka Destpêka Sînemayê
- 2- Dîroka Sînemayên Welatên Cîhanê
- 3- Sînema û Propaganda
- 4- Grass (Çîmen, Giya, Geya)

“Sînemaya Cîhanê”

Nivîskar: Dilazad A.R.T
Weşanxane: Weşanên Zanîngeh. Rûpel: 65 - 2017
Awayê Çapê: Dijital e-pirtûk pdf



“DEMÊ HATIYE MORKIRIN”

Piirtûka “Demê Hatiye Morkirin” (Muhurlenmiş Zaman), bi nivîs û gotarên Derhênerê Navdarê cîhanê Andrey Tarkovskî ve pêk tê û di nav nivîsa sînemayê de berhemekî gelek girîng e.

“Demê Hatiye Morkirin” / Nivîskar: Andrey Tarkovskî
Werger: Mazlum Beyhan

Weşanxane: Agora Kitaplığı. Rûpel: 272 - 2018



Li ser cîhanê, hevok û helbestên wisa hene ku bi peyvên xwe yên kêr ve gelek tiştan dibêjin û rave dikin.. Stran, çîrok lawij, kilam û govendên qala çaxê xwe û rojaneyê dikin... Bi peyvên xwe ve dibin dengên janên, hêviyên, rastînen, şadiyên û xiyalên ên hemû mazlûmên erdnîgarîya cîhanê... Ev hevokan di ser van de çend deman û sedsalan derbas dibin jî her wextê rojane dimînin û dibin deng û awazên banga hemû mirovahîyê...

“Dema ku ez vegerim di ser min de dê cilên yekî/ê din bibe..

Ez bi navê yekî din re dê bême gazî kirin..

Vegera min wekî dê bi rengê ecêb bibe û te bi çavên biteredût re ji min binêrî û dê tu bibêje “Ew tu nîne”..

Ez ji te re nîşanên wisa dê nîşan bidim ku tu ji min dê bawer bikî..

Ez ji te re, dê behsa ji dara lîmonê ku li baxçeya te re bikim..

Piştî tu nîşanên beden û evîne ku ji paceya min a piçûkê de bi tavehîvê re ronahî dibe, wê dê bibîne..

Ez ê ji te re qala çîroka bêdawî ya hemû mirovahiyê bikim...”


Wêne: Ji Filmê “Ulysses’ Gaze” (Nerîna Ulyssesê / Uliş’in Bakış) - 1995 / Derhêner: Theo Angelopoulos û Senaryo: Theo Angelopoulos, Tonino Guerra



E-Kovara Populer Kulturê



Kovara Derûnnasiyê bi Kurdî



Kovara Muzîka Kurdî



Em dixwazin ji filmên kevin çirokên nû derbixin...



Navenda Çand û Hunerê



Civata Çand, Huner û Sosyalîzasyonê

Celal ÖZTEKİN

Semire AYDEMİR

İsmail ÇELİK

Baskên Şikestî



Nivîskar/writer /Derhêner/director KADİR EMAN & VELİT ATAĞLI

Prodüksiyon / Produksiyon / Production MORDEM FİLM / SANAT PRODUCTION Yardımcı yönetmen / Alîkariya derhêner / Assistan director VELİT ATAĞLI Görüntü yönetmeni / Derhênerê Dimen / Director of Photograpy KADİR EMAN

Ses / Deng / Sound VELİT ATAĞLI Afîş / Afîş / Poster LAURA TROUCHE Kurgu / Pêvbestîn / Editing VELİT ATAĞLI-H ALİL İBRAHİM CEVİK Ulaşım / Hilbirîn / Transportation AHMET DOĞAN Çeviri / Wergêr / Translation ARDİN DİREN - HAKAN ÜNAL
Sanat Yönetmeni / Derhênerê Hunerê / Art Director MAHMÜD GOK Ressam / Wênegir / Painter JİYAN GÜNSEL Işık / Ronahî / Light / Fotoğraf/Wêne/Photo ŞEHMUS KİLİL Asistanlar / Alîkar / Assistant MUSTAFA AYDEMİR - UBEYDULLAH ATAĞLI